Komîteya Destekdayîna Zimanên Destpêkê yên Zarokan

Armanc û çalakiyên Komîteya DestekdayînaZimanên destpêkê yên zarokan

Armanca komîteyê:

Komîteya destekdayîna Zimanên Destpêkê yên Zarokan(IGE), ji bo teşvîqkirina zimanê destpêkê yê zarokan, bi taybetî jî di zarokên malbatên koçber de, ji bo têgihiştin û pêkanîna erkeke grîng a saziyên perwerdeyê ye hewl dide.

Endamtî:

Bi sedema dîdaktîk û pedagojîk, pê re ji sedema polîtîkayên ziman û entegrasyonê organîzasyon, komele û kesên ji bo pêkanîna armancên komîteyê hewl didin, dikarin bibin endamê komîteyê. Şertê bingehîn ê endamtiyê destxetkirina binê banga `destekdayîna zimanên destpêkê ê zarokan, erkeke grîng a saziyên perwerdeyê ye` ji aliyê organîzasyon, komele yeko yeko kesan e.

Hedef:

- Ji aliyê derdorên berfireh ên peywendîdar ve destekdayîna bangê û nasîna wê ya di nava civakê de,
- Di nava girseyên berfireh de, nasîna hincet, daxwaz û armancên IGE yê.
- Di sazûmana perwerdeya Swîsre de, girtina `teşvîqkirina zimanên destpêkê yê zarokan` nava bernameyên polîtîk ên libatên biryarê yên dewleta federal, kanton û şaredariyan
- Pejirandina daxwazên IGE yê û pêkanîna gav bi gav

Çalakiyên Şênber:

- Di dîroka 22.9.2007an de, vergerandina zimanên fermî yên welêt û zimanên komên koçber ên bi hijmarî grîng, a banga di civîna sazbûna IGE yê de hatiye pejirandin,
- Wekî erkeke grîng a saziyên perwerdeyê, di binê banga teşvîqkirina zimanên destpêkê yê zarokan de, komkirina destxetan ji organîzasyon, komele û yeko yeko kesên di qada zanyarî û lêgerînê de.

- Ji bo xebatên danasîna IGE yê, pêşdayîna Konferansa Medyayê ya netewî û xebatên medyayê yên bi pirzimanî, danasîna armanc û daxwazên wê.
- Ji bo xebatên lobî yên têkildarê navroka bangê, Koordînekirina Konferansa rêvebiriyên Perwerdeyê, dewleta federe, saziyên perwerdeyê yên kantonan, şaredarî û bajar, dibistanên bilind ên pedagojiyê û kes û saziyên din ên peywendîdar ên di nava polîtîka û civakê de,
- Bi dokumant û lînkên guhertî çêkirina malpera projeyê, bi taybetî jî çêkirina wê ya bi ber organîzasyonên endam ên IGE yê,
- Bi sitendina dokumantên ji organîzasyon û komeleyan, nivîsandina rapora di derbarê çalakiyan de,

Organîzasyona Kar û Fînansê

IGE, komek rêvebir a koordînekariya çalakiyan saz dike.Ev kom xwe rêkûpêk dike û kesên li der ve nûnertiya IGE yê bikin diyar dike. Ev kom, dema pêdivî were dîtin, dikare endamên IGE yê bangî civînê bike, bi taybetî di rewşên derveyî naveroka vê bangê ya guhertin û berfirehkirinê de;

Organîzasyonên endam an kesên yeko yeko ji dil û li gorî derfetan xebatên kordînasyonê yên IGE yê hildigrin ser xwe. VPDO, projeya perwerdeya navbera çandan di vê çarçoweyê de, kapasîteya sekretertiyê pêşkêşî xizmetê dike.

Li gorî pêdiviyê dikare ji organîzasyonên endam, Alîkariya diravî were xwestin.

Di civîna sazbûnê ya komîteya destekdayîna zimanên destpêkê ya 22 îlon 2007 an de hat biryarkirin.

Zürich, 24.12.2007 Zeliha Aktas